# Benckirên demarîya çarkînarî

Ev belavok tiştên ku tu ê di dema derbaskirina niştergerîyê benckirên demarî de bibînin rave dike. Ew ji aliyên bijîşên bencê, nexweş û nûnerên nexweşan ku bi hev re dixebitin hatiye nivîsandin.

## Naverok

Belavok van xalan rave dike:

- benckirên demarî çi ye
- çima tu dikarî jê ji bo niştergerîa xwe sûd wergirî
- çawa dixebite
- paşê çi dibe
- metirsî û biryagirtina hevpar.

## Derbarê benckirên demarî

Benckirên demarî derziyên bencê ne ku ji bo tevizandina damarên ku beşek diyarkirî ya laş peyda dikin tê dayîn, wek mînak, dest, mil, çîp an jî pê . Derzîkirina benckira herêmî rê li ber dayina îşaretên êşê digire û beşên laşî gêj û bêtevger dike, tevî vê yekê jî tu dikarî di dema prosedurê de tevger û kişandinê hîs bikî.

Di hin rewşan de benckirên demarî dikarin li şûna benckira gelemperî werin bikar anîn. Ev bi taybetî dikare bibe kêrhatî be ji bo nexweşên ku xwedî rewşa bijîjkî ne metirsîyeke zêde ya benckira gelemperî. Sûdeke din a neştergerîya bi rêya benckirên demarî de ev e ku ew metirsîyek kêm a hin pirsgirêkên ku bi benckira gelemperî re girêdayî ne vedihewîne.

Her wiha, benckirên demarî dikare bi benckireka gelemperî re were yekkirin da ku ji bo birêvebirina êşa piştî neştergerîyê bibe alîkar. Ew dikare heta 24 demjimêran piştî neştergerîyê kêmkirina êşê pêk bîne, her çend hin parçeyên laşî dibe ku heta 48 demjimêran pûç bimîne.

Amoşkirinbi gelemperî bi benckirên demarî re tê bikar anîn da ku tudi dema niştergerîyê de rihet û razayî bin. Amoşkirin dibe ku sivik an jî kûr be û piştî hamoşkirinê dibe ku tuher tişt bê an jî tu tiştek neyê bîra te. Tu dikarî zêdetir li ser amoşkirinê di belavoka me Ravekirina hedarkirinê ku bi zimanên cuda li vir berdest e bixwînî: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages

Anestazîkere te dikare ji te re bibe alîkar ku tu biryar bî bê kîjan ji van ji te û niştergerîya te re dê çêtir be.

**Sûdên benckirên demarîya çarkînarî**

- Kêmkirina êşê çêtir piştî neştergerîyê.
- Di heyama ewil ya piştî neştergerîyê de hewcedariya kêmtir bi dermanên êşkuj ên ku tê de opîoîd hene. Ev dikarin bikin ku tu xwe nexweş hîs bikî û dibe ku bibin sedema zikgîrîyê. Heke tu wan ji bo demek dirêj bixwî, kêm caran metirsîya wê ya tiryakê heye.
- Dûrketina ji benckireka gelemperî, tevî metirsî û bandorên alîy a wê. Bandorên aliyî yên hevpar ên benckira gelemperî nexweşî, kulbûna gewriyê û xewixînê dihundirîne.
- Tu dikarî zûtir rabî ser xwe, li ser xwe bigerin û ji nexweşxaneyê derkevî.

# Nirxandina berê niştergeriyê ya klînîkê (berê nirxandinê)

## Heger niştergerîyeke te ya plankirî hebe dibe ku tu berî çend hefteyan an rojan ji neştergeriyê bo nirxandina berê niştergeriyê ya klînîkê werin vexwendin. Carinan, ji bo zêdetir neştergerîyên piçûktir, Hemşîrek dê bi rêya telefonê bi te re biaxive da ku hin pirsan ji te bike.

Ji kerema xwe bi xwe re van tiştan bîne (an jî ji bo têlefonê li ber destê xwe bigire):

- lîsteya dermanên te yên heyî an dermanên te yên di pakêtên wan de tev lî pakêtên wan bi xwe re bîne
- heger tu dermanên ji bo rohnkirina xwînê dixwî, girîng e ku tîmê berê nirxandinê bi vê yekê bizanibin da ku ew dikarin nîqaş bikin ka gelo hewce ye ku tu xwarina van dermanan berî neştergerîya xwe bisekinî
- hemû agahîyên derbarê test û dermankirinên te yên li nexweşxaneyên din ku te derbaskirine
- agahîyên li ser pirsgirêkên ku te an malbata te bi benckirinê re derbas kirine
- pîvanên fişara xwînê ya herî dawî.

Tu dikarî li klînîkê bi bijîşkek bencê re hevdîtinê bikî. Ma, tu ê roja neştergerîya xwe li nexweşxaneyê bi bijîşka bencê ra hevdîtinekê bikî.

# Di roja niştergerîyê de

## Divê nexweşxane rênimayên zelal derbarê xwarin û vexwarin û wergirtina dermanan bide te. Girîng e ku meriv bi van rênimayan re pabend be.

### Destpêkirina benckirina demarî

Bi gelemperî tu ê bo jûreyeke li nêzî odeya emeliyatê an jûreya benckirnê bên birin da ku benckirên demarî bistinî. Amûrên çavdêrîyê dê bêne girêdan da ku tîm bikaribe li seranserê pêvajoyê rewşa te bişopîne.

Çermê li dora cihê derzîkirinê dê were paqij kirin û derziyeke biçûk a benckira herêmî dê were bikar anîn da ku çermê te pûç bike - her ku di tevnan de diçe dê piçekî biêşîne.

Piştî ku çerm pû dibee, derziyeke cûda tê bikar anîn da ku benckirên demarîy ê were lidarxistin. Di heman demê de bijîşka bencê dê makîneyeke ultrason bikar bîne da ku bibîne bê demar li ku ne û derziya bencê li cihê rast bixe.

Pir kes pê dihesin ku derzîkirin ji wergirtina kanûlayê (boriyek plastîk a tenik ku di nav damareke xwînê re tê bicihkirin) ne bi êştir e.

Beşa laşê te berî ku giran û tevizî bibe dê dest bi hîskirina germê û xwirînê bike. Derzîkirinê bi gelemperî di navbera 20 û 40 deqîqeyan de bandora xwe nîşan bide. Anestezîst dê hestên ku tu dikarî li cîhên hîs bikî kontrol bike. Tu ê bi odeya niştergeriyê neyên birin heta ku anestezîstê te piştrast nebe ku benckir baş dixebite.

Heger benckir bi tevahî nexebite, dê ji te re bêtir benckira herêmî, zêdetir dermanê kêmkirina êşê, an benckira gelemperî were pêşkêş kirin.

## Di dema niştergerîyê de

Ekranek dê bi awayekî wisa were danîn ku tu ê nikaribî neştergerîya ku tê kirin bibînî.

Di dema neştergerîyê de dibe ku tu bikaribî li ser cîhaza xwe bi berguhkên xwe bi dilê xwe li muzîkê guhdarî bikî - divê tu bipirsî gelo ev gengaz e an na.

odeya emeliyatê cîheke mijûl û qerebalix e - bi giştî dê di navbera pênc û heşt kesan de li odeya niştergeriyê hebin, ku her yek xwedan rola xwe ye di arîkariya lêmiqatebûna te de. Endamek tîmê benckirê dê li seranserê neştergerîyê bi te re be, û carinan endamên tîmê din dikarin bi te re biaxivin û di lênihêrîna te de bibin alîkar.

Heke tu dermanek amoşkirin bixwî, tu ê rehet û xewa bibî. Tu bi piranî oksîjenê bi rêya rûpoşeke sivik û plastîk bistînî. Dibe ku bîranînên te yên di odeya emeliyatê de hebin, her çend ev qels bin.

Ji bo agahîyên zedetir li ser amoşkirinê, ji kerema xwe belavoka me Ravekirina hedarkirinê bibîne: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages

## Piştî niştergerîyê

Bandora benckirên demarî dikare heta 48 saetan bidome. Di vê demê de beşa benckirî ya laşê te dê pir giran hîs bike û gava ku masûlkeyên te ji nû ve dest bi tevgerê bikin dê hewceyê piştgirî be. Ji ber ku tu ji neştergerîyê xelas dibî, dibe ku pêdivîya te bi kesekî hebe ku ji bo pêkanîna karên rojane, alîkarîya te bike.

Ji ber ku benckirên demarî li xwe dike, dibe ku tu di tilîyên xwe da pinî û derzîyan hes bikî. Ev bi tevahî normal e.

## Lênêrîna piştî niştergerîyê li malê

Berî ku tu derbikevî dê ji te re agahdarî were dayîn ku ji bo başbûna te li malê bibe alîkar. Dema tu vedigerî malê, hewce ye tu piştgirîyeke ku ji te ra dihê dayîn bi kar bînî.

Ev, ji ber ku di qada neştergerîyê da hîseke te ya tam tune ye û birîndarbûna we jî hêsantir dibe. Ev tevizandîbûn bi gelemperî dibe ku heya 48 demjimêran bidome.

- Bi taybetî bi çavkaniyên germê, weke agir an jî radyoaktîf bala xwe bide derdorê. Dema ku organên bedenê tevizî bin, tu nikarî germahiyê hîs bikî û dibe xwe bişewitînî.
- Ji bikaranîna amûr an jî alavên malê, wekî çaydank, utîk û alavên çêkirina xwarinê dûr bisekine.
- Berî ku benckir biqede, li gorî talîmatên nexweşxaneyê dest bi dermana kêmkirina êşê xwe bike. Ev girîng e ji ber ku bandora benckirên demarî ji nişka ve dikare raweste.

### Kengê tu ê alîkariyê bixwazî

Tu dê hewce ye ku ji xizmetên bijîşkî yên lezgîn alîkarîyê bixwazî:

- Tu bêhêvîtiya nediyar dibînî
- êşa te ya giran hebû ku ji alîyê êşbiran ve nayê kontrolkirin.

Heke du roj piştî niştergerîyê tu bencker temam nekî, divê tu bi rêya telefonkirina hejmara kaxizên xwe yên derketinê bi beşa benckirinê ra bikevî têkiliyê.

## Agahiyên zêdetir derbarê benckirên damaran

Ra-UK, Komeleya anesteziya herêmî ya vîdeoyek agahdarî ji bo nexweşên girtî yên benckirên demarî çêkiriye: Benckirên demarî: vîdyoyek agahdarî ji bo nexweşan: www.ra-uk.org/index.php/patient-info-video

# Metirsî û biryara hevpar

## Bûjenên benckirên nû, tevî benckirên demarî, pir ewle ne. Lêbelê, hin bandorên alî yên hevpar ên ku bi benckirina demarî ve girêdayî ne hene, ku bi gelemperî ne ciddî ne an dirêj in. Kêmtir benckirên demarî dikarin zirarê bidin demaran.

Zêdetir agahdarî li ser van metirsîyên dikarî di belavoka me ya xetereyê de bibînî Zirarbûna demaran ji ber rêgirtina demarên çarkenarî.

Anestazîkerê te dê bi te re li ser talûkeyên ku ew bawer dikin ku ji te re girîngtir in gotûbêj bikin. Ew ê tenê metirsîyên ku kêmtir hevpar in nîqaş bikin heger ew xetere têkildarî te be.

## Biryargirtina hevpar

Biryargirtina hevpar piştrast dike ku mirov têne piştgirî kirin da ku biryarên ku ji bo wan rast in werbigirin. Ew pêvajoyeke hevkariyê ye ku bijîşkek piştgirîya nexweşekî dike da ku derbarê dermankirina xwe de bigihîje biryarekê.

Di axaftinê de wiha tê gotin:

- pisporîya bijîşkî, wekî vebijêrkên dermankirinê, delîl, metirsî, û sûd
- tiştên ku nexweş baştir dizanin: tercîhên wan, şert û mercên kesane, armanc, nirx û bawerîyên wan.

Ji vêr agahîyên zêdetir bistîne:
www.england.nhs.uk/personalisedcare/shared-decision-making

Li vir hin amûr hene ku tu dikarî bikar bînî da ku bi baştirîn şêwe sûdê ji nîqaşên bi bijîşka bencê an xebatkarên nirxandina emeliyatê re bikin werbigirî:

### Hilbijartina çarçoveya Wisely UK BRAN

Vê yekê wekî bibîrxistinekê bi kar bîne da ku tu li ser dermankirinê pirsan bipirsî.
https://bit.ly/CWUK_leaflet

### NHS sê pirsan bipirsin

Dibe ku di derbarê çavdêriya tenduristîya te de hilbijartin hebin.
https://bit.ly/NHS_A3Qs

### Navenda Çavdêriya Nişterkarî (CPOC)

CPOC anîmasyonek hilberandîye da ku biryargirtina hevpar rave bike.
www.cpoc.org.uk/shared-decision-making

## Pirsên ku dibe ku tû bixwazî bipirsî

Heger pirsên te derbarê benckirê xwe hebin, wan binivîse (tu dikarî mînakên jêrîn bikar bînî û yên xwe li cîhê jêrîn zêde bikî). Heger tu dixwazî rojeke berî niştergerîyê bi Anestazîkera/ê xwe re bipeyivî, bi koma nirxandina emeliyatê re têkevî têkiliyê da ku ji te re amade bikî ku tu bi telefonê bi anestezîstek re biaxivî an wan di klînîkê de bibînî.

**1. Metirsîya min a taybetî heye ku bi vî benckirî nexweşî bibim?**

**2. Ma ez di metirsîyek benckira gelemperî de me?**

**3. Heke beneckir nexebite çi dibe?**

Destjêkişandin

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yên gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi tîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin niqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev ji bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran ji alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsînor) tên çêkirin. Çawanîya van wergeran ji bo duristîya van heta ji dest tê tên venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

# Ji me re bêje ka tu çi difikirî

Ger şîroveyên te hebe, ji kerema xwe wan ji vê e-mailê re bişîne : patientinformation@rcoa.ac.uk

**Royal College of Anaesthesists**
Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

## rcoa.ac.uk

**Çapa Sêyemîn, Pûşpera 2023**
Ev belavok dê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nirxandin.

**© 2023 Royal College of Anaesthesists**
Dibe ku ev belavok ji bo çêkirina bûjena agahiya nexweşê were kopî kirin. Ji kerema xwe, çavkanîya orîjînal binivîse. Heke tu dixwazî beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar bînî, divê destûreke guncaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahîyên zêdetir, ji kerema xwe bi me re têkeve têkilîyê.